

Girê Erbîd

Girê Erbîd li herêmên Xabûr nêzî Girê Çaxirbazar ê şûnwarî; dikeve. Gir dûrî Bajarê Qamişlo dora 28 km bi aliyê başûrê rojavayê wê ye.

Girê Erbîd ji cihên girîng e di rojhilata kevin de. Di destpêka hezarsala sisyan de b.z xuyakiriye weke bajarê herî girîng li bakurê Mezopotamyayê. Ev cih ji girekî sereke ku li derdora wî çar girên biçûk hene; pêk tê. Rûbera vî girî dighêje 38 hiktaran û ji deşta ku ew rapêçandiye bi 30 m bilintir e.

Bermahiyên niştecihbûnê yên yekem li vî cihî vedigere hezarsala pêncan b.z, ev niştecih di nîvê yekem ji hezarsala sisyan b.z; pêşketiye her wiha qewareya vî cihî zêdebûye ta ku rûbera wî gihastiya dora 10 hiktaran. Di dawiya hezarsala sisyan de b.z rêzbûyerên guhartinê rûdan ku qewara niştecihê biçûk bû û avasaziya xanî û avahiyên nişîgehiyê kêmbûn.

Di nîvê hezarsala didwan b.z de, ev bajar bû parçeyek ji Împeratoriya Hûrî-Mîtanî ya mezin, komikên xaniyan ên ji heriyê hatine çêkirin li ger şêwazê Mîtanî her wiha kolan,goristan û komek ji muhrên stûnî yên ku vedigerin vê qonaxê; hatin dîtin.

Di nava hezarsala yekem de b.z, niştecihbûn bi awayekî ber bi çav kêmbû, ta qonaxa Helsentî bûbû wek bajarekî biçûk.

Lêkolîn: lêkolînên yekemîn li vî cihî di navber 1934-1936 an de, ji aliyê şandeya Birîtanî ve û bi rêveberiya (Max Malwan); dest pê kir. Piştî ji aliyê şandeya hevbeş a Sûrî-Polonî bi serokatiya Rafayêl Kolînîskî ji sala 1996 an de ji nû ve dest pê kir. Van lêkolînan perestgeh, xanî û şûnwariyên cur be cur ku vedigerin qonaxên cuda; derpêç kirin.

Komikek xincer + serim û dasek ji Tel Erbîd ku vedigerin qonaxa Bironz

Tirbeke dîroka wê vedigere qonaxa Bironz a kevin(3000-2200)b.z

Tirbeke dîroka wê vedigere qonaxa Bironz a navîn(2000- 1600)b.z

Komikek ji xişir, morîk û berbisk dîroka wan vedigere ta sala 1800 B.Z

Komikek ji xilikên Xabûr dîroka wan vedigere ta sala 1800 B.Z